# Bultena heftane

# 7/4/2024

Email: **starmalper13@gmail.com**

Facebook:kongra star-مؤتمر ستار

Youtube: kongra.star22@gmail.com

Nûçeyên ji cîhanê

## Jinên kurd ji bo azadiya Abdullah Ocalan li Vatîkanê ne

NAVENDA NÛÇEYAN - Jinên Kurd di çarçoveya pêngava "Ji Abdullah Ocalan re azadî, ji pirsgirêka kurd re çareseriya siyasî" çûn Vatîkanê.

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/231491?page=1

Çavkanî:JINNEWS




## Pirtûka 'Jin Jiyan Azadî. Di agirê şoreşa jinên Rojava de' derket

NAVENDA NÛÇEYAN - Pirtûka 'Jin Jiyan Azadî. Di agirê şoreşa jinên Rojava de' ya Enstîtuya Andrea Wolf a Jineolojî ve hate weşandin. Wê pirtûk di navbera 6 û 19'ê Gulanê de li 13-14 bajarên cuda yên welatên Katalan wê ji aliyê koma amadekariya pirtûkê ve were pêşkêşkirin.

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/231621

Çavkanî:JINNEWS



# [Elmanya bi hinceta hevkariya qirkirina li Filistînê dê were darizandin](https://jinhaagency.com/ku/hiq%C3%BBq/elmanya-bi-hinceta-hevkariya-qirkirina-li-filistine-de-were-darizandin-44798)

Nîkaragûayê bi hinceta ku Elmanyayê hevkarê qirkirina li Filistiniyê ye doza li Elmanya vekir li Dîwana Edaletê ya Navneteweyî dest pê dike.

https://jinhaagency.com/ku/hiq%C3%BBq/elmanya-bi-hinceta-hevkariya-qirkirina-li-filistine-de-were-darizandin-44798

Çavkanî:JINHA



## Jinên Sêrtê bandora tecrîdê vegotin

SÊRT - Jinên Sêrtê der barê tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan û polîtîkayên şerê taybet de axivîn û gotin: "Bêyî Apo wê şer hebe. Bila aştî pêk bê, ev zilm bi dawî bibe."

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/231455?page=1

Çavkanî:JINNEWS




## Peyama jinên Wanê: Têkoşîna jin û ciwanan bi ser ket

WAN - Jinên ku di nava serhildana dîrokî ya Wanê de cih girtin, diyar kirin ku ji ber mazbatayê girtin gelek kêfxweş bûne û gotin têkoşîna jin û ciwanan bi ser ket.

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/231461?page=1

Çavkanî:JINNEWS



## Li Wêranşarê mirina bi guman

RIHA - Jina bi navê Helîn Altundag li navçeya Wêranşarê bi awayekî guman jiyana xwe ji dest da.

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/231493?page=1

Çavkanî:JINNEWS




## Çeteleya Tundiyê ya meha Adarê: 24 jin hatin qetilkirin

NAVENDA NÛÇEYAN - Di meha Adarê de 24 jin û 2 zarok hatin qetilkirin, 24 jin û 2 zarokan jî bi guman jiyana xwe ji dest dan.

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/231567?page=1

Çavkanî:JINNEWS



## Gulîstan Sonuk: Em ê felsefeya 'Jin jiyan azadî' belav bikin

ÊLIH - Hevşaredara Êlihê ya DEM Partiyê Gulîstan  Sonuk ku li dijî zîhniyeta ku jin tune dihesiband bi hevşaredar, ev bang kir: “Li dijî vê tifaqa mê ya rêxistinkirî, têkoşîna azadiya jinê bigihînin siberojan.”

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/231569

Çavkanî:JINNEWS



## Li Lîbyayê cilên gelêrî bi destên jinan tên çêkirin

Li Lîbyayê pîşekarên Kurd, bi ked û dizaynên xweşik ên ku navê wan li ser e derdikevin pêş û cil û bergên çanda Kurdî ango cilên gelêrî çêdikin. Van model û dîzaynên ku çêdikin ji aliyê gelek kesan ve tên ecibandin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-libyaye-cilen-geleri-bi-desten-jinan-ten-cekirin-44748

Çavkanî:JINHA



## Rojnamevana Lubnanî Nada Ayoub: Ez dixwazim rastiyan derxim hole

Rojnamevana Lubnanî Nada Ayoub, diyar kir ku jinên Lubnanî gelek zehmetiyan dikşînin, hewl didin di nava van zehmetiyan de hebûna xwe îsbat bikin û da zanîn ku bi rûbirûbûna rewşa li welat re bûye dengê kolanan.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/rojnamevana-lubnani-nada-ayoub-ez-dixwazim-rastiyan-derxim-hole-44747

Çavkanî:JINHA



## Jinên Sûdanê yên ji cih û warên xwe bûne ji bo jiyanê têdikoşin

Jinên ku ji ber pevçûnên li Sûdanê didomin neçar man koç bikin, li herêmên ku dimînin di karên cuda de dixebitin û ji bo ku bikaribin jiyana xwe bidomînin têdikoşin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-sudane-yen-ji-cih-u-waren-xwe-bune-ji-bo-jiyane-tedikosin-44752

Çavkanî:JINHA



## [Jinên Tûnisî bi stranan ji xwe re stargehek ava kirin](https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-tunisi-bi-stranan-ji-xwe-re-stargehek-ava-kirin-44771)

Jinên li bajarê Sûseyê di Kuluba Stranan a Jinên Xweşik de tên ba hev, perwerdeya muzîkî dibînin, stranan dibêjin. Kuluba ku ji bo jinan bûye stargeh, stres û westandina rojê dide jibîrkirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-tunisi-bi-stranan-ji-xwe-re-stargehek-ava-kirin-44771

Çavkanî:JINHA



## [Sebahat Tuncel: Berxwedana Wanê ji bo rawestandina desthilatê destpêk e](https://jinhaagency.com/ku/rojane/sebahat-tuncel-berxwedana-wane-ji-bo-rawestandina-desthilate-destpek-e-44773)

Siyasetmedara girtî Sebahat Tuncel diyar kir ku pêkanînên rejîma qeyûm û tecrîdê ne tenê gelê Kurd hemû gelên Tirkiye tengav kiriye û got: “Dema rawestandina vê yekê hatiye, berxwedana Wanê ji bo vê destpêk e.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/sebahat-tuncel-berxwedana-wane-ji-bo-rawestandina-desthilate-destpek-e-44773

Çavkanî:JINHA



## Qeyarana aborî bandorê li jinên xwedî kar dike

Jinên bajarê Silêmaniyê diyar kirin ku nedana mûçe û qeyrana aborî herî zêde bandorê li jinên xwedî kar dike û divê jin ji bo mafên xwe bi dest bixin têkoşîn û çalakiyên xwe berdewam bikin.

https://jinhaagency.com/ku/ked-u-abori/qeyarana-abori-bandore-li-jinen-xwedi-kar-dike-44774

Çavkanî:JINHA




## ‘Em li hemberî Talîbanê serî natewînin’

Roshan Latîfî li Baxçeyê jinan ku ji aliyê Talîbanê ve li jinan hat girtin, karê dirûtinê berdewam dike û got: “Ji bo em cilên ne li gorî Îslamê nedirûn me hişyar dikin. Dixwazin em ji wan bitirsin û neyên cihê kar. Em serî li ber van nezanan natewînin.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/em-li-hemberi-talibane-seri-natewinin-44776

Çavkanî:JINHA



## ‘Bila sûcê leşkerên Îsrailê yê li dijî jin û zarokên keç were lêkolînkirin’

Jinên Misrê di nameya ji çar aliyên cîhanê re şandî de xwestin ku sûcên Îsrailê yê li dijî jin û zarokên keç yê li Xezayê bên tesbîtkirin û lêkolînkirin kirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/bila-suce-leskeren-Israile-ye-li-diji-jin-u-zaroken-kec-were-lekolinkirin-44779

Çavkanî:JINHA



## ‘Sedema sereke yê qetilkirina jinan hikûmete’

Di derbarê zêdebûna diyardeya tûndiya aborî û derûnî ya li dijî jinan de, jinên çalakvan gotin: “Sedemê sereke yê qetilkirina jinan hikûmete, ji berku dema jinek tê qetilkirin, yasa ne serwere û yasa nayên bicihanîn. Destpêkê tûndiya li dijî jinan zêdetirê xwe fîzîkî bû, lê niha zêdetir tûndiya derûnî û aborî li dijî jinan tê meşandin. Sedema wê jî bi xwesteka desthilatdarî û hişmendiya zilamsalarî ve girêdaye.”

https://rojnews.news/ku/?p=316093

Çavkanî:ROJNEWS



## Li Pişder jinek dawî li jiyana xwe anî

Jinek xelkê gundê Zurkan yê devera Pişder ku bi guleya demanceyê jiyana xwe ji dest da di danê êvarê de gihandin nexweşxaneya Ranyayê. Li gorî kesûkarên wê dibêjin; Dawî li jiyana xwe aniye.

https://rojnews.news/ku/?p=316191

Çavkanî:ROJNEWS



## MKG: 7 jinên rojnameger di girtîgehan de ne

AMED - MKG'ê di rapora binpêkirina mafên jinên rojnameger de diyar kir ku di meha adarê de jî binpêkirina mafên jinên rojnameger dewam kir û got:"Derbarê rojnamegerekê de lêpirsîn hat destpêkirin û dozên rojnamegeran didomin. Li gor raporê darizandina 10 jinên rojnameger dewam dike û 7 jinên rojnameger jî niha di girtîgehan de ne. "

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/231586

Çavkanî:JINNEWS

## ‘Divê merc werin avakirin û Abdullah Ocalan rola xwe ya aştiyê bilîze’

60 girtiyên li Girtîgeha Jinan a Sîncanê tên girtin, di nameya ku ji Wezareta Dadê û rayedarên dewletê re şandin de, xwestim tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan were bidawîkirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/dive-merc-werin-avakirin-u-abdullah-ocalan-rola-xwe-ya-astiye-bilize-44789

Çavkanî:JINHA




## ‘Divê ragihandin di nava çînan de wekheviyê ava bike’

Mamaosteya beşa ragihandinê Ciwan Celaledîn diyar kir ku erkê ragihandinê ew e ku dema pirsgirêkêk hebe û dide tayîsandin divê li gora wê pirsgirêkê riyên çareseriyê jî di ragihandinê de biteyisîne û di nava çînan de wekheviyê ava bike.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/dive-ragihandin-di-nava-cinan-de-wekheviye-ava-bike-44791

Çavkanî:JINHA



## Rasha Al-Gabaly: Jin bi karê ofîsê re sînordar tê hiştin

Sekretera Giştî ya Federasyona Sendîkayên Misirê Raşa El-Gabaly, diyar kir ku jin di jiyana kar de bi mêran re ne xwediyê şert û mercên wekhev in û diyar kir ku jin ji ber saetên xwe yên kar bi karên ofîsê re sînordar tê hiştin.

https://jinhaagency.com/ku/ked-u-abori/rasa-el-gebeli-jin-bi-kare-ofise-re-sinordar-te-histin-44792

Çavkanî:JINHA



## Li Tûnisê jin ji bo bandora guherîna avhewayê kêm bikin hewldanên xwe didomînin

Li Tunusê aktivîstên hawirdorê, bandora nerênî ya guherîna avhewayê li ser jinan tesbît kirin û ji bo van bandoran kêm bikin hewldanên xwe yên şexsî û kolektîf berdewam dikin.

https://jinhaagency.com/ku/ekoloji/li-tunise-jin-ji-bo-bandora-guherina-avhewaye-kem-bikin-hewldanen-xwe-didominin-44794

Çavkanî:JINHA




## Li Tûnisê wê tundiya li dijî jinê bê protestokirin

Komeleya Jinên Demokratîk a Tûnisê, wê tundiya li dijî jinan a zêde dibe bi meşê protesto bike. Jinên ku diyar kirin rayedar ji bo pêşîgirtina li tundiyê tedbîrên pêwîst nagirin û gotin ku ew ê bi hemû hêza xwe li dijî tundiyê têbikoşin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-tunise-we-tundiya-li-diji-jine-be-protestokirin-44797

Çavkanî:JINHA



## Koalîsyona Jinan bang li şaredariyan kir: Pêşerojê bi hevre em bi guherînin

Koalîsyona Jinan bang li şaredariyan kir û got: “Beriya hilbijartinê me got em ji başiya xirabiyê razî nabin. Em divê mijarê de bibiryarin. Em bang li şaredariyên daxwaza guherînê dikin! pêşerojê bi hevre em bi guherînin”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/koalisyona-jinan-bang-li-saredariyan-kir-peseroje-bi-hevre-em-bi-guherinin-44803

Çavkanî:JINHA



## CD’yên ku nayên bikaranîn bi wêneyan vediguherîne tabloyan

Xwendekara Lîseyê ya Lubnanî Tiya Qaid Bey, CD’yên ku nayên bikaranîn bi xêzkirinê vediguherîne tabloyan.Tiya Qaid ku heta niha hezar tablo çêkirine, li bendê ye ku marqeya avakiriye bê tomarkirin.

https://jinhaagency.com/ku/ked-u-abori/cd-yen-ku-nayen-bikaranin-bi-weneyan-vediguherine-tabloyan-44811

Çavkanî:JINHA



## Li Pirsûsê çiwaşê pispor ê Tirk tecawizî jinekê kir

K.K. ê ku li Fermandariya Cendirmeyan a Navçeya Pirsûsê wek çawişê pispor û parêzvanê qeymeqamtiyê xwe da nasîn, tecawizî jina bi navê M.M. kir.

https://anfkurdi.com/rojane/s-182142

Çavkanî:ANF



## [‘Ji bo dawî li tundiyê bê, divê yasayên girêdayî jinan bên guhertin’]

Parlamentera berê ya parlamentoya Iraqê Rêzan Şêx Dilêr derbarê tundiya dijî jinan de got; “Ji bo ku tundiya li beramberî jinan dawî bibe, divê yasayên taybet girêdayî tûndiya jinan bên guhertin, civak û malbat hişyartir bin.”

https://rojnews.news/ku/?p=316306

Çavkanî:ROJNEWS



## Piştî 8 salan car din li şaredariya xwe ne

Jinên ku piştî 8 salan ji nû ve serxistina DEM Partiyê re hatin Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê ku qeyûm hatibû tayînkirin, ev peyam dan: “Em ê êdî destûrê nadin tayînkirina qeyûman. Ewê nikaribin îradeya gelê Kurd, jin û ciwanan bişkînin.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/pisti-8-salan-car-din-li-saredariya-xwe-ne-44823

Çavkanî:JINHA



# [Tevlîbûna jinên Mexrîbê di jiyana kar de kêm dibe](https://jinhaagency.com/ku/rojane/tevlibuna-jinen-mexribe-di-jiyana-kar-de-kem-dibe-44825)

Endama Koalîsyona Wekheviyê Amîna Toubalî jî diyar kir ku li Mexrîbê ji sedî 82'ê jinan nikarin bikevin nava jiyana kar û diyar kir ku ji ber newekheviya di jiyana kar de cudahiya hejmara jin û mêran gav bi gav mezin dibe.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/tevlibuna-jinen-mexribe-di-jiyana-kar-de-kem-dibe-44825

Çavkanî:JINHA



# [Delegasyona Jinê: Divê hêzên demokratîk bên gel hevdu](https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/231716)

AMED - Ji endamên Delegasyona Jinê yên ji bo şopandina hilbijartinê li Kurdistanê bûn Zelal Zaharija û Sosin Sonnenberg, dan zanîn tevî ku pêvajoyeke zehmet e jî rêxistinbûyinek heye û gotin:"Ji bo belavkirina tevgera kurd, ji bo têkoşîna kurdan li Ewropayê belav bibe, Ji bo daxwaza azadiya Abdullah Ocalan divê hêzên demokratîk bên gel hevdu."

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/231716

Çavkanî:JINNEWS



## Dayika ku teslîmiyet qebûl nekir: Uveyş Ocalan

NAVENDA NÛÇEYAN - Ji ser koça dawî ya dayika Uveyş 31 sal derbas bûn. Dayika Uveyş heta koça xwe ya dawiyê jî teslîmiyet qebûl nekir û têkoşîna jiyanê heta dawiyê da.

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/231720

Çavkanî:JINNEWS



## Li Ebexê jinekê bi awayekî guman jiyana xwe ji dest da

WAN - Jina bi navê M.B. li navçeya Ebexê bi awayekî guman jiyana xwe ji dest da.

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/231783

Çavkanî:JINNEWS




## [Jinên endezyar di jiyana kar de li dijî ‘aqilê mêr’ têdikoşin](https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-endezyar-di-jiyana-kar-de-li-diji-aqile-mer-tedikosin-44833)

Komaleya Endezyarên Jin ên Tûnisê ku ji bo têkoşîna li dijî feraseta ku di jiyana kar de jinan paş ve dikşîne hatiye avakirin, jinên endezyar teşwîq dike ku hê zêdetir înisiyatîfê bigrin û beşdarî jiyana kar bibin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-endezyar-di-jiyana-kar-de-li-diji-aqile-mer-tedikosin-44833

Çavkanî:JINHA




## Ji sûcê êrişa zayendî ya li dijî zarokan 31 hezar û 216 doz hat vekirin

Sûcên êrişa zayendî ya li dijî zarokan zêde dibe. Hat zanîn ku li dadgehên ceza yê Tirk ji ber êrişên zayendî yê li dijî zarokan 31 hezar û 2016 dosya hene.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/ji-suce-erisa-zayendi-ya-li-diji-zarokan-31-hezar-u-216-doz-hat-vekirin-44837

Çavkanî:JINHA



# Ji Pakistanê ji bo jinên Efgan bang: Dengê wan bibihîzin

Komek jinên li Îslamabad a paytexta Pakistanê li hev civiyan bang li saziyên navneteweyî kirin ku li cem jinên Efgan bin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/ji-pakistane-ji-bo-jinen-efgan-bang-denge-wan-bibihizin-44842

Çavkanî:JINHA





# Li Şengalê jin ji bo aboriya xwe ya serbixwe têdikoşin

Li Şengalê jin ji bo bidestxistina aboriya xwe ya serbixwe têdikoşin. Li navçeya Xanesorê ya Şengalê bi pêşengiya jinan Kafe Nîsan ku hemû xebatkarên wê jin in hat vekirin.

https://jinhaagency.com/ku/ked-u-abori/li-Sengale-jin-ji-bo-aboriya-xwe-ya-serbixwe-tedikosin-44845

Çavkanî:JINHA



## ‘Rojnamegerên jin rastî tundiya derûnî û fizîkî tên’

Rojnamevan Pariz Sabre Mohammad Saleh, diyar kir rojnamevanên jin her roj di saziyên ragihandinê de rastî tundiya derûnî û fizîkî tên û wiha got: “Rojnamegerên jin ji ber tirsa ji kar avêtinê neçarê dimînin bêdeng bimînin.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/rojnamegeren-jin-rasti-tundiya-deruni-u-fiziki-ten-44854

Çavkanî:JINHA



## 'Jineolojî wateya jiyanê ye'

HELEB - Berdevk û nûnerên Jineolojî ya bajarê Helebê di salvegera 4'emîn a vekirina navenda Jineolojiyê ya Helebê dan zanîn ku ew felsefeya Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan ji xwe re bingeh digirin û hewl didin xwe bigihînin hemê civakê. Her wiha gotin:"Jineolojî wateya jiyanê ye."

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/231457?page=1

Çavkanî:JINNEWS




## Mala Jin pirsgirêkên hemu jinên ji pêkhateyan çareser dike

Mala Jin li hemû herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê roleke girîng dilîze. Berdevka Mala Jin a taxa El-Teyî Yasmîn Îsa, behsa kar û xebatên xwe di nava taxa El-Teyî de dike û dibêje ku bi riya Mala Jin pirsigirêkên jin dijîn çareser dikin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/mala-jin-pirsgireken-hemu-jinen-ji-pekhateyan-careser-dike-44786

Çavkanî:JINHA



# Jinên Ereb cil û bergên xwe yên kevneşopî diparêzin

Jinên Ereb cil û bergên kevneşopî an jî wek ku jê re dibêjin “cil û bergên Ereban” li xwe dikin û wek beşek ji tevna çanda herêmê dihesibînin. Jinên ku pê dihesin ku çanda civakê bi awayekî zelal xêz dikin, di parastina vê çandê de israr dikin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-ereb-cil-u-bergen-xwe-yen-kevnesopi-diparezin-44832

Çavkanî:JINHA



# Bi vekirina dibistanên dayikê jin hîn zêdetir di jiyana kar de xuya bûn

Bi dibistanên dayikê ên di bin berpirsiyartiya Meclîsa Jin de li Kantona Firatê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatin vekirin re, armanc ew e ku jin beşdarî jiyana kar bibin û zarok di nav jîngeheke tendurist de mezin bibin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/bi-vekirina-dibistanen-dayike-jin-hin-zedetir-di-jiyana-kar-de-xuya-bun-44847

Çavkanî:JINHA



Kongra Star

11/4/2024